



K.T

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Sparteka Lîsansa Bilind a Bêtez

KURTEŞÎROVEYEKE ZANISTÎ DI ŞÊWEYÊN MORFOLOJÎYÊ DE

MUSTAFA TEMEL

13721089

FAYSAL BULUT

13721066

Şêwirmend

Doç. Dr. Rafik Sulaîman

Mêrdîn 2017

NAVEROK

NAVEROK.....	1
DESTPÊK.....	2
1-MORFOLOJÎ.....	3
2-MORFEM BI GIŞTÎ ÇIYE?.....	3
3-XEBATÊN LI SER MORFOLOJÎYÊ HATIYE KIRIN.....	4
4-STÎLÊN MORFOLOJÎYÊ.....	5
4.1- Morfema Azad.....	5
4.1.1. Ji Aliyê Binyadê ve Bêje.....	6
4.1.2. Bêjeyên Xwerû.....	6
4.1.3. Bêjeyên Nexwerû.....	7
4.1.3.a. Bêjeyên Dariştî.....	7
4.1.3.b.Bêjeyên Hevedudanî.....	7
4.1.2 . Ji Aliyê Cureyan ve Bêje.....	7
4.2- Morfema Neazad.....	7
4.2.a. Qertafên Peywirî.....	8
4.2.b. Qertafên Çêker.....	9
ENCAM.....	11
ÇAVKANÎ.....	12

KURTEŞÎROVEYEKE ZANÎSTÎ DÎ ŞÊWEYÊN MORFOLOJÎYÊ DE

DESTPÊK

Em bi vê xebata xwe dixwazin mijara morfolojîyê bi awayekî zelaltir bidin ravekirin û wexta hinekan xwestin lêkolînekê li ser vê mijarê bike vê xebata me jî li ber çav bigirin û di çarcova vê xebatê de tevbigerin. Di lêkolîna me de pirtûkên ku me ji wan sûd wergirtîye, ew jî ev in: pirtûka Ahmed KANÎ bi navê "MORFOLOJÎYA KURMANCÎ Û ZIMANNASÎ" û pirtûka zimannasê Tirk Dogan AKSANÎ bi navê "HER YÖNÜYLE DİL-ANA ÇİZGİLERİYLE DİLBİLİM".

Di vê xebata xwe de em li ser morfolojîyê, cureyên morfolojîyê ji serdema peydabûna vekolînên morfemê û xebatên ku ta niha li ser morfolojîyê (B.Z.) û piştî zayînê sekinîne.

Li dinyayê pênc malbatên zimanan hene. Ew jî ev in :

- a- Malbata zimanên Hînd-Ewropayî
- b- Malbata zimanên Ûral-Altayî
- c- Malbata zimanên Bantûyî
- d- Malbata zimanên Çîn-Tîbetî
- e- Malbata zimanên Hamî-Samîyî

Zimanê Kurdî cihê xwe di nava malbata zimanên Hind-Ewropayî ku ew di nava beşê zimanên Aryanî de dabeşbûye.

Ziman ji aliyê sazîkirinê ve dibin sê beş:

- 1- Zimanên Yekkîteyî
- 2- Zimanên Qertafgir
- 3- Zimanên Tewangbar

Her weha Zimanê Kurdî, zimanekî tewangbar û qertafgir e wek nimûne: pêşgir, paşgir û navgir.

Her weke mînak: aborî-nas, zir-bav, reş-e-ba.

-nas paşgir e, zir- pêşgir e , -e- jî navgir ango navbend e.(1)

Zimannasî, bi giştî tevahiya ziman bi her awayî dikole û dide ber xwe û vekolînê li ser dike. Lê belê, rêziman li gorî şert û merc û destûra xwe wek rênivîs ziman organîze û dûzan dike.

Gramer di xwe de beşên wek fonetîk, morfolojî, etîmolojî, sentaks û dîyalektolojî di hundirîne.

Heger em dubare bikin, armanca me ew e ku em li ser morfolojî, cureyên morfolojî û xebatên ku ta niha li ser morfolojîyê hatinê kirin bi kurtasî rave bikin ku ev mijar bi hêsanî were fahm kirin.

1-MORFOLOJÎ

Morfolojî bi rêya frensî *morphologie* ya inglîzî *morphology* ji yewnaniya kevn *μορφή* (şêwe, dirûv, dilq, form, şikil) + *-lojî* (zanist) pêk tê.

Morfesazî zanista vekolana pêkhatin û sazûna bêjeyan e. Heke mirov bi awayekî din bibêje, mirov dikare morfolojîyê wek zanista danasaziya bêjeyan bibîne. Peyv ji morfeman pêk tê ango morfem yekîneka herî biçûk a watedar e.(2)

Peyvsazî ango; morfolojî beşeke zimanzaniyê ye. Bi riya vê beşa zanistê, mirov reng û dirûvê bêjeyan, cureyên wan û rêz û rêzikên pêkanîna bêjeyan nas dike.(3) Herwiha *morfolojî* ne tenê çêkirina peyvan e, lê ew hemû awayên çemandin û girêdanên peyvan û eyarkirina wan ya li gor dem û rewşên rêzimanî ye jî, li xwe digre. (4) Mirov dikare bibêje ku ew morfesazî beşeke herî girîng yê zimannasiyê ye.

2-MORFEM BI GIŞTÎ ÇIYE?

Morfem an morfêm, di zimanzanistî de biçûktirîn yekîneka ziman e. Sîmantîk ji aliyê ramanzanistîyê ve xwedî ramanêke xweser e. Di zimanê axaftinê de morfem ji foneman pêk tên. Îro bi gelenperî *morfem*, wek yekîneka biçûktirîn a watedar di zimên de tê qebûl kirin. Ev morfema ku ji dangan pêk tê têkilîya wê bi kêteyan re nîne. Wekî mînak di bêjeya "veşartî" de kîte bî awayê *ve-şar-tî* ye, lê wekî morfem *veşart-î* tête qebûl kirin.

Zanistê Emerîkî Bloomfieldî, morfem bi du cura dabeş kiriye, ev cure wekî *xweser* (*free*) û *nexweser* (*bound*) bi nav kiriye. Her wekî mînak di peyvên mirî, sarinc, sorik de; mir, sar, sor xweser ango bi wate nin lê -î , -inc,- ik bi tena serê xwe bê wate û erk in lewra nexweser in.

Zimannasê Fransî A. Martinetî li ser mijara morfemê bi awayekî cudatir sekinîye, wî têgeh û terma "*moneme*" bikar anîye. Di gelek zimanên din jî ev term tê bikar anîn. A. Martinet bal kişandiye ser cudahiya di navbera *moneme* û *morfemê* de.

2 <https://ku.wiktionary.org/wiki/morfolojî>

3 <https://prezi.com/pguule6bqd7i/1-peyvsazi-rezimana-kurmanci/>

4 <https://zimannas.wordpress.com/2015/08/04/kanizar-1-peyvsazi-di-zimane-kurdi-de/>

Martînetî balê dikşîne ser du aliya di zimanê merivî. Li gor Martînetî, rista ku mirov dikare bi "rista rêzbûna yekem" bi nav bike hem nîşanker hem jî yê tê nîşandayîn digirin nava xwe. Wek mînak: Av -a şêlû ve-ne-xw-e! Ev hêman bi bal yekîneyên manedar yên biçûktirîn ve nayên parçe kirin; lê her yek ji wan di nava agahdariyên nû yên bêhejmar de dikarin cih bigrin, wek **ava** zelal, **ava** şîn, **vejîn**, **vejen**, **neçe**, **negrî**, **xwar**, **bixwe**...(5)

Di "rista rêzbûna duyem" de her ziman xwedî dengên bi sînor in. Di zimanê Kurdî de dizîn û dirîn bi tîpên /z/ û /r/ yê wate diguhere.

Belê li vê derê birêz Martînetî rastiyekê tîne zimên ku dema tîpên wan tîne guhertin hem ji aliyê fonolojî û morfolojî û watesaziyê guhertinek çê dibe lê di nêrîna me de ev dupatkirina birêz Martînetî têrê nake çinku di dema ku mirov di aliyê fonolojî de şrove dike cudabuneke din derdikeve holê ku ev jî ew e ku "rr" dubare dibe û hem wateyê diguhere û hem jî ji aliyê fonolojîyê de tê guhertin.

Li gel vana em dikarin têgeha *alamorf* ango *hemanşeweyî* bidin nasîn: morfem ku heman wate û erkê pêk tîne, lê ji hêla dengên ve cuda be, ji vê cuda şeweyê re hemanşeweyî tê gotin. Ev têgeha cara ewil ji aliyê zimannasê Emerîkî E. A. Nida ve hatiye bi kar anîn. Heger em mînakên hemanşeweyîyên kurdî bidin, wek mînak : Ez **nikarim**, Ez **naxwazim**. Li vir "**ni** û **na**" heman wate û erkê pêk tînin lê ji hêla dengên ve cuda ne.

3- XEBATÊN KU LI SER MORFOLOJÎYÊ HATINE KIRIN

Lêkolînên ku îro di bin navê morfsaziyê de tên kirin, di demên herî pêşîn de, xebatên rêziman û zimannasîyê ku li ser diyarkirina raderên peyvan, rader û ji hev cudakirina girêkên peyvan radiweste jî digre nava xwe.

Li gor gelek zimannasan lêkolînên di bin navê morfsaziyê de hatiye kirin diçe heta berî zayîne sedsala 5'an ku (B.Z) sedsala 5'an de li Hindîstanê bi navê Yaska'yî zanistek li ser etîmolojîya zimên xebitiye. Li Yewnanîstana kevn Arîsto jî xebat li ser diyarkirina cureyên peyvan kiriye. Di pirtûka Dîonysios Thrax a bi navê "*Têkne Grammatîk*" de navên taybet û yên cureyan ji hev hatine cûdakirin, taybetiyên kişandina lêkeran di zimanê Yewnanî de hatiye diyar kirin.

Bi taybetî di sedsala bîstan de Saussureî, ziman wekî pergalekê nîşan daye û yekîneyên zimên di nava vê pergalê de bi cihên xwe nixandiyê û bi vê fikrê rê û rêbazên nû li ziman zêde kiriye. Her wekî din xebatên Noam Chomsky li ser rêziman û morfsaziyê girîng in. Bi taybetî Chomsky di pirtûka xwe ya *Language and Mind* de li ser pergala zimên û gramerê bi hûrgilî sekinîye.

Yekem kesê ku têgeha morfolojîyê bikar anîye "*morphophoneme, morphophonem*" Trubetzkoy e. Li pey wî zanistên weke Blomfield, Swadhes, Lyons, A. Martînet xebat û lêkolîn li ser morfolojîyê kirine. (6)

Dibistana Zimannasiya Emerîkanî girîngiyek bêhempa daye morfolojîyê. Damezrînerên vê dibistanê Frans Boas, Edward Sapir in. Leonard Bloomfield, Zelling Harris, E. A. Nida û Charles Francis Hockett di vê dibistanê de lekolinên hêja kirine.

5 Ahmed Kanî, Morfolojîya Kurmancî û Zimannasî, r. 21

6 Doğan AKSAN, Her Yönüyle Dil, Cilt 2, r. 79

Heger em werin ser xebatên morfsazîya kurmacî em ê bibînin ku rewşeke aloz derdikeve pêşberî me. Kî dizane belkî bi rastî jî *cografya qeder** be. Heta niha xebatên morfsazîya zimanê Kurmancî di nava xwe de ne xwedî termînolojîyeke wek hev e. Bi giranî li ser zîmên xebatên rêzimanî hatine kirin, xebatên morfolojîyê jî wek beşek rêzimanî bi metodên kevneşopî hatine kirin. Di vî warî de çavkanî gelek di bin destê me de nînin, lê çavkanîyeke nû ku me ji xwe agahdar dike di gotara Prof. Dr. Kadri Yildirimî a bi navê "Elîyê Teremaxî û Dîtinên Wî Yên li Ser Rêçikên Rêzimana Kurdî" ya bi navê "Destûra Zimanê Erebi Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî" ye.(6)

Piştî Eli Teremaxî xebatên girîng ji aliyê Yusuf Ziyaeddîn Paşa ve hatiye kirin. Xebatên wî bi navê " El-Hedîye El-Hamîdiyye Fîl-Lugat El-Kurdiyye/Diyariya Hamîdiyê Ya Di Zimanê Kurdî De" di sala 1894 an de li Stenbolê hatiye çapkirin.(7)

Xebatên hêja ji aliyê Kurdên Qafqasî bi amadekirina Alfabeya Kurdî hatine kirin. Yekemîn alfabetaya kurdî ya bi tîpên latînî ji aliyê Erebe Şemo û Îsahak Marogûlovhatiye amadekirin. Bi biryara hikûmeta Sovyeta berê û Ermenîstanê Erebe Şemo û Isahak Marogûlovî ku bi eslê xwe Aşûrî ye dest bi amadekirina alfabetaya kurdî ya bi tîpên latînî kirin û di sala 1928'an de karê xwe bi dawî anîn. Wan di sala 1929'an de yekemîn pirtûka bi kurdiya latînî li cihanê bi sernavê *Xə-xə hinbuna xəndəna nvisara kÿrmançî* (Xwe-Xwe Hînbûna Xwendina Nivîsara Kurmancî") çap kirin.

Divê zimannasê hêja û qedirbilind Qanetê Kurdo yê ku ji aliyê zimên û morfolojîyê xebatên girîng kiriye jî neyê jibîrkirin.

Mirov dikare *Rêzimana Kurdî* ya Celadet Bedirxan û Roger Lescot ya bi fransî wek yekem rêzimannameyê bide ku bi berfirehî behsa morfolojîya kurmancî tê de hatiye kirin.

Xebatên morfolojîya kurmancî bi xebatên Mîr Celadet Bedîrxan ve gihîştîye asteke herî bilind. Di 15'ê Gulana 1932 an de Mîr Celadet Bedîrxan dest bi weşana Kovara Hawarê dike. Hejmarê Hawarê ji 1'ê heta 23'yan bi tîpên Erebi derdikevin. Ji 24'an heta 57'a bi Alfabeya Kurdî ya latînî diweşe. Bingeha morfolojîya kurmancî bi berfirehî di van hejmaran de tê avêtin

4-STÎLÊN MORFOLOJÎYÊ

Çawa fonem yekeya herî biçûk a dangan e, morfem jî yekeya herî biçûk a peyvan e. Di kurdî de jî wekî gelek zimanên din morfem dibin du cure :

4.1- Morfema Azad:

Ev morfem weke rayeka bêjeyan jî tê nasîn ku bi serê xwe jî wateya wê heye.

Weke mînak: Azad, Reş, Pel, Çilo, Gir.

* Straneke Mohsen Namjoo bi navê Jabre Joghrafiyî

6 Qedri Yildirim, Kovara Bir, Hejmar 1, r. 192-198

7 Ferhenga Kurdî-Tirkî, Yusuf Ziyaeddîn Paşa, Weşanên Çira, Stenbol, Mijdara 1978.

4.1.1. Ji Aliyê Binyadê ve Bêje

- Bejeyên Xwerû

-Bêjeyên nexwerû

Bêjeyên nexwerû jî du cure ne.

a) Bêjeyên Dariştî

b) Bêjeyên Hevedudanî

4.1.2. Bêjeyên Xwerû

Bêjeyên xwerû ew bêje ne, ku ji rayekên bêjeyan yê wekî parçeyên watedar ku nayên parçekirin û bêjeyên ku qertafên bêjeçêker negirtine û nehevedudanî ne pêk tên.

Rayek di nava xwe de dibin du beş:

1. Rayekên Navan: Ev cure rayek di binyada xwe de nav in; di rayekên navan de tevger tune ye.

Mînak:

boz, dest, nan, çav, mal.

2. Rayekên Lêkeran: Ev cure rayek di binyada xwe de lêker in. Hemû rayekên lêkerên xwerû dikevin vê cureyê.

Mînak:

ket, çû, hat, bir.

Nîşe: Hin rayek hene ku hevdeng in. Hem weke rayekên lêkeran tên bi kar anîn hem jî weke rayekên navan.

Mînak:

Pezên xwe kir du **bir**.

Gulê satila xwe **bir**.

4.1.3. Bêjeyên Nexwerû

Bêjeyên nexwerû du beş in:

a) Bêjeyên Dariştî

b) Bêjeyên Hevedudanî

4.1.3.a. Bêjeyên Dariştî

Bêjeyên dariştî ew bêje ne, ku rayekên wan pêşgir, navgir û paşgirên bêjeçêker girtine.

Weke mînak:

Ên pêşgir standî: **ber**-devk, **bê**-mirad, **î**-şev, **ra**-ket, **ve**-xwar.

Ên navgir standî: pêş-**e**-roj, dêl-**e**-gur, mak-**e**-zagon, got-**e**-got, ser-**an**-ser.

Ên paşgir standî: bez-**a**, zan-**a**, mêr-**anî**, xort- **anî**, kurt-**asî**, civ-**at**.

4.1.3.b. Bêjeyên Hevedudanî

Bêjeyên ku herî kêr ji du parçeyên watedar pêk tên, wekî bêjeyên hevedudanî tên bî nav kirin.

Weke mînak: Marmasî, Gulav, Cildirûn, Çavşîn, Xweşmêr, Devliken, Pozbilind, Dengbêj, Helkehelk, Hêlehêl, Hêkerûn.

4.1.2 . Ji Aliyê Cureyan ve Bêje

Li gor zimannasên kurd bêjeyên ku di bin mijara rêzimanê heşt cure ne; ew jî ev in:

1) **NAV**: Refîk, Mistefa, Feyzel, dar, mêr, pîrtûk, pêûs, lênûsk, çira, çem, keftar, derpî, qutik, zencîr, kelem, demançe...

2) **CÎNAVK**: ez, tu, ew, em, hûn, ew...

3) **HEVALNAV** : sor, mezin, biçûk, têr, birçî, xweşik, dirêj, baş, xerab, tiral, jîr...

4) **LÊKER**: çû, hat, da, go, bir, xwest, dît, veşart, kir, stand...

5) **HOKER**: jor, jêr, ser, bin, duh, îroj, par, pitirpar, sibê...

6) **DACEK**: bi, li, ji, di, ve, da, di.....de, bi.....ve....

7) **GÎHANEK**: aş û baş, **ne** li jêr **ne** li jor...

8) **BANEŞAN** : ax!, oyy!, lêê!, hooo!

4.2- Morfema Neazad

Ev jî wek cureyên qertafan tê nasîn ku bî bêjeyan di nava hevokan de tên bi kar anîn û girêdayî bêjeyan in.

Li gor Bahoz Baranî qertaf dibin du beş:

a) Qertafên Peywirî

b) Qertafên Çêker

4.2.a. Qertafên Peywirî

Ev qertaf wateya peyvan naguherînin, hinek peywiran dihewînin û li peyvan bar dikin ji aliyê dem, zayend, mêjer, pirjimarî, kesan û hwd. peyvan diyar dikin. Qertafên peywirî ev in :

1) Qertafên Raweyê: Qertafên raweyê wateya peyvan naguherînin, ji aliyê dem, xwestek û daxwazê ve peywirê li lêkeran bar dike.

Mînak:

Ew ji min hez **dike**.

Em ê **biçûna**.

Ez jî **biçim**.

Refîk çûye çiya.

2) Qertafên Cînavkên Kesîn: Ev qertaf parçeyên cînavkên kesîn ên xwerû ne, bî pêveberan re tên bi kar anîn.

Mînak:

Ez **çûm**.

Tu **çûyî**.

Em îro **diçin**.

3) Qertafên Diyarîyê: Ev qertaf zayend û mêjera peyvan diyar dikin.

Mînak:

Hevalan cil **şuştin**.

Min ji Sînemê **pirsî**.

Helîme yekî **dibîne**.

4) Qertafên Nenasîyê: Ev qertaf wateya kes û tîştan nediyar dikin.

Mînak:

Hev**alek** hat.

Pirtû**keke** xweş stend.

Heval**in** hatin.

5) Veqetandek: Ev qertaf di ravekan de tîn dawiya raveberê û zayend û mêjera wê diyar dikin.

Mînak:

Dara hewşê hişk bûye.

Nanên sêlê bîne.

Hevalê te hatiye.

6) Qertafên Baneşanê: Ev qertaf tîn dawiya navdêr û lêkeran û wan dixin rewşa baneşanê.

Mînak:

Kuro! Zu were vir.


Hevalino! Em çî bikin.

Te serê min xwarê!

7) Qertafa Daçekî: Daçekên "ji û li" yê dî hinek rewşên têrkeriyê de dibin **-î**. Ev hêman êdî dibin qertaf û hevbendiyê bi peyva berî xwe re çê dikin.


Mînak:

Bêtir ji wî xebitî.



Bêtirî wî xebitî.

Rast li wî hatim.



Rastî wî hatim.

8) Qertafa Hokerî: Ev qertaf bêtir bi hokerên mêjerî û bi lêkerên gerguhêz re tê bi kar anîn.



Mînak:

Mîn gelekî xwar.

Tu hinekî bîne.

9) Cînavka Pêgir: Ev qertaf tê dawiya lêkeran, şûna peyva piştî wan digire.

Mînak:

Te pênuş da Gulê.  Te pênuş dayê.
 Min rahişt pirtûkê.  Min rahiştê.

10) Qertafa Raderî: Radera lêkeran **-in** e. Ev qertaf tê ser lêkeran û navê wan çê dike. Dema ku lêker li gorî raweyan tên bi kar anîn ev qertaf ji wan tê avêtin.

Mînak:

Hatin  Hatina te em kêfxweş kirin.
 Gotin  Ji gotinê fahm nake.

4.2.b. Qertafên Çêker

Ev qertaf tên ser rayekû gewdeyên peyvan, wateyên wan diguherînin û ji wan peyvên nû çê dikin. Ev qertaf ji pêşgir û paşgiran pêk tên.

1) Pêşgirên Peyvçêker: Pêşgir tên pêşiya peyvan û ji wan peyvên nû çê dikin. Hinek ji wan daçek in; lê wek qertaf tên bikaranîn, hinek ji wan jî peyv in lê êdî ew jî wek qertaf tên bikaranîn.

Mînak:

bê-dil, bê-kes, bi-kêr, bi-xêr, ne-çar, ne-heqî, ne-xweş, ne-sax, da-gir, hil-ber, hil-kêş, ra-dest, ra-ser, ve-bêj, ve-şar, wer-ger, ba-dan, ve-xwarin, wer-gerandin, hel-west, hel-best, man-ga, zir-bav....

2) Paşgirên Peyvçêker: Di kurmancî de bi piranî peyv ji paşgiran tên çêkirin. Paşgir tên ser navdêr, lêker û rayekên lêkeran, ji wan peyvên nû tên çêkirin.

Mînak:

berçav-k, bijart-e, bilind-ahî, bir-yar, civ-ak, çav-î, dît-bar, guh-ar, gul-dank, keland-î, mêr-ane, mûr-istan, rast-ek, rewş-en, sar-inc, şand-e, teng-asî, bêj-e, bîn-er, ajo-ker, kuj-er, xwaz-gîn...

Hîşyarî: Hinek peyv hem pêşgir hem jî paşgiran digirin.

Mînak: bê-zar-î, ne-dî-tî, ne-zan-î...

ENCAM

Me di vê xebata xwe de bi gelenperî morfolojî li ber çavan girt. Me dît ku xebatên morfolojîyê weke beşeke zîmannasiyê pênc sed sal ji berî zayînê de dest pê kiriye û ta roja me bi hûrgilî hê jî xebat li ser dibin. Li gor lêkolîn û xebatên me li ser mijara rêziman û morfsazîyê kirine hê jî di deryayên zimên de cihên ku mirov xwe ne gîhandiyê û bi gûman hene.

Di serî de xebat li ser etîmolojîyê ku pêwendiya di navbera tişt û navên tiştan de digirt ji aliyê Yaskayî ve hatiye kirin. Feylesofê gewre yê Yewnanî Arîsto jî li ser cureyên peyvan sekiniye û bi metodek serkeftî heşt cureyên peyvan diyar kiriye ku heta îro jî tê qebûl kirin.

Di sedsala bîstan de Saussureî, ziman wekî pergalekê nîşan daye û yekîneyên zimên di nava vê pergale de bi cihên xwe nirxandiye û bi vê fikrê rê û rêbazên nû li ziman zêde kiriye. Her wekî din Noam Chomsky li ser rêziman û morfsazîyê xebatên girîng kiriye. Bi taybetî Chomsky di pirtûka xwe ya *Language and Mind* de li ser pergala zimên û gramerê bi hûrgilî sekiniye û rê û rêbazên *rêzimana hilberîner* bi awayekî serfirazî rave kiriye.

Me got em dikarin bêjin xebatên morfolojîyê bi Elî Teremaxî bi navê "Destûra Zimanê Erebi Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî" nivîsandiye dest pê kiriye. Li pey wî gelek xebatên morfolojîya klasîk hatine kirin. Mirov dikare bêje ku yekem car xebata berfirehî di zîmanê Kurdî de ji aliyê Celadet Elî Bedîrxan û zîmannasê Fransî Rober Lescot hatiye kirin. Kovara Hawarê û Ronahîyê bi xebatên wî yên rêziman mişt in.

Em bi kurtî li ser pirsra morfem û monem û alamorfan û cureyên morfemên rawestiyên. Ew cureyên morfemê yên ku ji morfema azad û ne azad pêk tên.

Em bi vê lêkolîna xwe gihaştin wê encamê ku hîna xebatên zimanvanî li ser pirsra morfsazîyê di zîmanê Kurdî tînin xwestin. Her çiqas xebatên klasîk li ser morfolojîya zîmanê Kurdî hebin jî, wekî mînak xebatên binyadî (*strukturel*) nîne. Ji alîkî ve, ev xebatên binyadî wê zimên dewlemendtir bike û herweha ew dikarin xizmeta xebatên berawerkirina zîmanvanî di navbera zîmanên beyanî û Kurdî bikin.

ÇAVKANÎ

- 1- BARAN, Bahoz: Rêzimana Kurmancî, Weşanên Belkî, 2012
- 2- AKSAN, Doğan, Her Yönüyle Dil, Türk Dil Kurumu Yayınları, 2007
- 3- KANÎ, Ahmed: Morfolojîya Kurmancî û Zimannasî, Weşanên J&J, 2017
- 4- BEDIRXAN, Elî Celadet-LESCOT Roger: Kürtçe Gramer, Weşanên Avesta, 2012
- 5- CHOMSKY Noam: Dil ve Zihin, Bilgesu yayınları, 2011
- 6- KURDO, Qanatê: Rêzimana Kurdî, Weşanên Nûbihar, 2013
- 7- TAN, Samî: Rêzimana Kurmancî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2011
- 8- YILDIRIM, Kadrî: Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi, MAÜ TYDE Yayınları, 2012
- 9- HASSANPOUR, Amir: Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil, Weşanên Avesta, 2005
- 10- Kovara HAWAR-Weşanên Belkî, 2012